

# NE DÛR E

M. Şêrewî

Careka din cejna azadiyê, bi ala hêrsa Kurdayetiyê bejna berbanga xwe xemiland, bi rengê sor navê xwe li eniya demê nîgarkir. Belê ... xwîna pakrewanan pertavên rojê bi rengkirin, û di îşqa rojê de tîn berdan.

Karwanên şehîdan li goristanên Kurdistanê dîlanên azadiyê gerandin, lîlîyên dê û yadan asîmanê bê 'ewir qelaştin, dijminên mirovatiyê bi destên xwe yên qirêj hîzala rûmetiyê bi sextîperestiyê lewitandin, pêlên tengijandinê, sînorên dademeniyê rasteçep leqandin û hejandin.

Li şeva cejna azadiyê, agirê Newrozê ... agirê Kawayê hesinkar, xelata xwe diyarî xwedê kir û li ser wê xelatê di nav du kevanan de hatibû danîn ( Ey xweda sê Pakrewan bi navê pêxemberê te Mihemed ji bo aşî û azadiyê bûne qurban ).

Belê... Mihemed ..... Mihemed û Mihemed bi tacên sorgulî serên wan hatine xemilandin. Li bejna wan kesk û sor û zer wekî keskesora Buharê pir lihevhatî bû. Dêmên wan yên nîşana azadiyê vedidan û radimûsandin. Roja bîst û yekê Avdarê bereniyê wê ji tariya berê şevê bû, stranên xemlandina zavan şahîka dahîk û silopanbûn. Ta bi Lal û ker û Kûran, bi lep , deng li hevdû vedigerandin û digotin : Newroz aşî ye.... Newroz dademendî û wekhevî ye, Newroz azadî ye, û Şehîd namr e.

Belê... Ey Mihemed... Ey Mihemed...û ey Mihemed , li roja cejna Kurd û Kurdistanê, ji Qamîşlo

bajarê evînê ta Kobanî û bajarê aşiyê Efrîna delal keç û xortan, jin û mêran, pîr û kalan reş girêdan. Kenê şahiyê di dêmên xwe de qurmiçandin, navên we sê Mihemedan li ser eniyên xwe nivîsandin, li cihên mihrecanên newrozê ji bo canên we nimêja kêferatê kirin û strana Şivan perwer ( Ey şehîd şehîd ) kevir û zinarên çiyayê Kurmêç bi girîdikirin. Li seranserî Kurdistanê dêmên Kudperweran şîn dipijikandin, ji çavên ciwan û egidan birûskên berxwedanê dijenîn, û kela dilê wan agirê Newrozê gurdikirin. Li gund û bajarên, ji sê pakrewanên Newrozê re, Kurdan bejna xwe ditewandin, û sirûda Ey Reqîb diyarî goristanên pakrewanan dikirin.

Belê... ey sê Mihehedên azadiyê... sê pakrewanên Newrozê..

Kurdan şîn û şahî dane berhev, bi reş sipî restrin.

Hiş û dil dane berhev, li ser alên reş navên we danîn.

Kurdan kul û derd li bîra xwe anîn, di rûpelên Avdarê de, navên we jî ji zêr danîn.

Ey pakrewanên newrozê...

Ey şehîdên azadiyê...

Ey Mihemed, Mihemed û Mihemed... ji bîrnekin diyariya koma pakrewanên Hîroşîma Kurdistan, bêjine wan, îro Helebçe azad e, ji bîrnekin ew diyarî.

Ne dûre... na ne dûr e , rojekê diyariya we jî wê ji were bê.